

Osîtiyaya Başûr û Ebxaziya Du pirsên din li Qefqasê

Rozad Elî

Osîtiyaya başûr, beşê bşûr e ji herêma Osîtiyayê. Di sala 1878an de Rûsiyayê tevahiya Osîtiyayê dagîr kir. Piştî şoreşa Lênîn, û li dema Stelîn, Osîtiya kirin du perçe, yê başkur di nav Komara Rûsiyayê de ma, û perçê başûr jî bi ser Gurcistanê ve xistin. Rûbera Osîtiyaya başûr 3900 km², hejmara Şêniyê wê dora 70000 kes e. Zimanên fermî Osîti û Rûsî ne.

Herêma Ebxaziya li sala 1931ê bi ser Gircistanê ve xistin. Rûbera wê 86000 km². Hejmara rûniştvanên wê 200000 kes e. Zimanên fermî Ebxazî û Rûsî ne. Piştî jevşelîna Yekîtiya Sovyêtê li sala 1990î, ew herdu herêmên ku di çarçewa dewleta Gurcistanê de mafê Xudmixtarî bidest xistibûn, doza cudabûnê ji Gurcistanê kirin û serbixwebûn danezanîn. Ji ber wê jî, şerine dijwar di navbera destlata Gurcistanê, li aliyekî û çekdarên wan herdu herêman li aliyekî din çê bûn, li dawiyê û bi alikariya Rûsiyayê hêzên Gurcistanê li wan herdu herêman têkçûn, ji Osîtiya û Ebxaziya vekşîn û herdu herêman jî serbixwebûna xwe ji Gurcistanê danezanîn. Lê belê, ew pirs bi şeweyekî aştîyane çareser nebû û Gurcistanê ew rewşa ku bi darê zorê çê bibû nepejirand. Ji ber wê jî, Pevgirêdana Dewletên Serbixwe ku li wê hîngê xort bû, hêzên aştîyê di wan herdu herêman de bicih kirin, û şer rawestî, lê belê pirsgirêka wek agirekî di bin xaliyê de ma.

Pişt re, Ebxaziya û Osîtiya gelek caran gazî li saziyên navdewletî kirin, ku pirs wan bi Gurcistanê re, mîna pirsên gelên Belqanê, çareser bikin, û ji bo wê yekê gelek caran doza vepirsînê kirin, lê daxaziya wan guhên vekirî nedîtîn.

Li destpêka meha Rezberê/Tebaxê, hukumeta Gurcistanê biryar stand ku bi darê zorê Osîtiyaya Başûr vegeirîne bin sîwana xwe, lê wek hat dîtin artêşa

Komara Rûsiyayê li ber wê yekê rawestî, subayên xwe hêriş kirin û gihîştin nîvê welatê Gurcistanê û bi wê tevgerê pêlana serokê Gurcistan Salîkeşvîlî lê vegeirand û têk bir.

Wekî ku tê zanîn, gelek dewletên ku roja îro xwedî sînor in, sînorên wan li ber roniya gelek tiştên tevlehev û bê dadî hatine danîn. Di piraniya caran de, ew sînor li gor encamên şerên mezin, yan di encamên talanên xwînrej yê kevin de hatine danîn. Ango sînorên piraniya wan dewletan, bi şûr û xûnê hatine resim kirin û taybetmendî û dilxaziyên gelên di nav de dijîn jî hîç nehatine birin.

Ji bilî wê, li piraniya wan dewletan, eger sazûmanên wan nijadperestiyê najon jî, ew wekhevî û dadmendiyê li ser hemî pevgerên civakê û rûniştvanên wê nameşînin û herdem destê beşekî ji şêniyê wê dewletê di ser ên din re ye, bitaybetî jî eger sazûman ne demokrat be.

Bi dehan nimûneyên demdirêj ku bêçare mane di vî warî hene, ew bûne wek birînên reş û kulên hilgirtî, guman heye ku di hemî deman biteqin û derbin, jixwe bi teqîna wan re, qeyran/kirîze peyda dibin, pêre jî dengê kuştin û kaviliyê bilind dibe û di encamê de ew pirs her diçin girantir dibin û mirovên sade dibin qurban.

Pirs û qeyrana Osîtiyaya Başûr û Ebxaziya jî du mînakên germ in di wî warî de, û hîn ew pirs bi rewşa ku niha gihîtinê bidawî ne bûne, loma jî xwînrejî dê di vir de nesekine.

Di asta ku roja îro şaristaniya mirov gihîştîyê de, dem lêhatiye ku saziyên navnetewî têbigihên, ku nîr û mercên avakirin û hebûna gelek dewletan ne li gor bergeha azadiya mirov û gelan e, û gelek gel – biçûk û maezin- ji hemî mafên xwe û di serî ji mafên çarenûsî bêpar mane. —————>